Nêrîn

Ismet M. Bedel

Pirtûkxane, ne tenê li xwandingeh û kolîj û zankoyan hene, belku li fermangeh û saziyên dewletê, li kargeh û senteran, li her taxekî ji taxên her bajarekî jî dîsan li her gundekî jî pirtûkxane lê hene. Pirtûkxane jî ne bi tenê bo nivîsîna raportên xwîndekarane yên ku mamoste jê daxwaz dikin û ew dihên bê xwandin û têgehiştin, tiştê wan bivê ji pirtûkan vebiguhêzin, belku herdem ji xwandevanan çi fermanber bin, yan kirêkar yan welatiyek bêkar jî, pir in.

Di van pirtûkxaneyan de, hemû corên pirtûkan, zanistî, dîrokî, edebî… htd hene. Ji bilî kovar û rojname û belavokan, ku xwedan xwe nabîne rawestiyayî, tiştê seyr, ne Tv û ne têlistar û ne kompiyoter û internêt û ne rîtma bi leza jiyana hevçerx, kartêkirin li rêjeya xwandevanan nekiriye, xwandevan çi delîveyan ji dest xwe nade, tenê bo xwandinê terxan dike, demê çaverêya basê yan tirênê dike.

Li rojên bêhinvedanê, di ber qehwevexwarinê re, xwandin di jiyan wî de parçeyek pirgiring e.

Helbet eva me li serî gotî, ne li welatê me û ne jî li welatên cîranên me, heye, belku ev li welatên rojava heye, lewma jî camêran di hemû waran de gelek pêşkevtîne, ne bi tenê di zanist û tiknolojiyê de, belku heta radeya çawaniya serederîkirinê jî li gel hev du, ji me baştir in. Ew zaroyên xwe ji biçûkatî, ne bi tenê fêrî xwandinê dikin, belku fêr dikin ka çawa hez ji xwandinê jî bikin, û li her cihekî ew lê, çi mal, çi xwandingeh, pirtûkxaneyek, lê heye.

Li cem me, kêm xwandingehan, pirtûkxane lê heye, li gelek bajêrên me jî, pirtûkxaneyên navendî lê nînin, zarokên me jî heya mezin dibin wesa dizanin ku xwandin tenê ya pirtûkên xwandingehê ye û ji wê jî direvin. Tevî vê yekê, em hemû basê civakê sivîl û dîmokrasiyê û mafê mirovî jî dikin.Werin da li berahiyê giringiyê bidin avakirina kesatiya mirovê xwe û ji zarokên xwe dest pê bikin, hezkirina xwandinê û geryan li zanyariyan di nav de biçûnin, belku paşerojek geş.